2013




# ASOYA HELBESTÊN KURDÎ


# DI ŞOPA MELA Û XANÎ DE...

HELBESTÊN | Helbestvanên Rûpela Asoya Helbestên Kurdî

# “ASOYA HELBESTÊN KURDÎ”

# HELBESTÊN HELBESTVANÊN RÛPELA ASOYA HELBESTÊN KURDÎ

# “HER TIŞT BI KURDÎ XWEŞ E!”


ASOYA HELBESTÊN KURDÎ

## DI DERHEQÊ PROJEYÊ DE

**Navê Projeyê:** Projeya e-pirtûka helbestên ji endamên rûpela facebookê ya "Asoya Helbestên Kurdî"

**Plan:** Wek danezanekî di rûpelê de proje hate vegotin. Du-sê meha ji endaman helbest hatin. Kesek herî zêde dikarî bi du helbestan beşdar bibe. Di dawiyê de helbest hatin komkirin û ev e-pirtûk hate amadekirin.

**Rêveberin û Amadekirin û Redaksiyon: RÊNAS XENDEKÎ**

**NAVEROK**


**Pêşhevok……………………………………………………………………6**

**Feratê Dengizî (Bi du helbestan)……………………………………………7**

**Berken Bereh (Bi helbestekî)……………………………………………..11**

**Beghyani Shadi Sharin (Bi du helbestan)…………………………………..14**

**Ozgur Yûce (Bi du helbestan)…………………………..………………...16**

**Dilşad Mella (Bi du helbestan)…………………………………………18**

**Orhan Basî (Bi du helbestan)……………………………………………..20**

**Mert Mertal (Bi du helbestan)…………………………………………....22**

**Qedrî Nêçîrvan (Bi du helbestan)………………………………………..24**

**Evîn Tetwan (Bi helbestekî)……………………………………………...26**

**Waristan Jîr (Bi du helbestan)……………………………………………..27**

**Osman Îzol (Bi helbestekî)………………………………………………29**

**Rênas Xendekî (Bi du helbestan)………………………………………….30**

***Ji bo Zarokên Kurdan…***

**BERBANGÊ / Feratê DENGIZÎ**

Taştiya bilind
Çiya bêdeng e
Xweza jî
Şiyarî berî berbangê bi dengê çivîkan e
Bi libata teyr û tirûran
Bi xişexişê ye
Bi vîtevît û çîkeçîka wan
Herîkîna jiyanê ye

Ji ber rohniyê
Rohnî şiyar dikê hişyar dike

Û
Heya ku dibetilin
Ku xwe bi tavê dişon
Dipîrozînin rojê
Xweperest in
Rojperest in

Karker û kedkar jî
Irgatên çolê
Birçî dibin û xew
Lê ku daringxwir ketibin çiyê
Kujêr û neyarên jiyanê
Ya Star!
Xwedê mirov bisitirîne...

Bêdengî her tiştî vedibêje
Dengê hovîtiyê jî
Yê ku fêhm bike...

Dixwazim di hundirê guleyê de
Wek gule
Wek guleyê bigihêm te
Biteqim û gulan vebikim

Lewra gule li ku bikeve
Li wira gulan vedike
Gul ji guleyan tê
Ji dewsa derbeyên wê
Bi xwîna evînê
Tu dizanî derbeyên evîn û keserê
Di berbangê de
Wek ku çîçek ji çiçikan tê
Jê diafire û bi nav dibe
Ji çiçikên dayê, yê yarê û bingeha hebûnê
Di vê bêdengiyê de
Min bi çiçik û çîçekên Hewa / Hawê
Û gul û çîçekên Şanîdarê
Hişyar bike
Helal bike...

Gelawêj - Mijdar 2008



**NAPEYÎVIN / Feratê Dengizî**

Bêdeng in
Navserên çiyan
Av û robar
Berf û baran
Kaş û evraz
Dar û ber
Û xweşzelaliya kaniyan
Bêdeng in…
Bayê serê çiyan
Bagerên dol û newalan
Ji tiliya xwe bêhndikin / bêhnakin
Kew û kevokên berrî
Ne bihawar in
Dibên “Ma hawar e!”
Bes di hestiyên me de biçêrin
Şîr nema di pêsêrên çiya de
Teba bêliv in
Ne ji xirrê demê ye
Şîrhelalî şîrheramî têkilhev
Kel lêdixe, difûre zeman
Diherike seleba çala te
Tu di seleba çala demê de birrî
Seleba çala bavê wê
Firra avê nemaye ji şoreşê re
Li benda kenê te
Li hêviya dilopa dawî
Ya xwîna te ne
Bila kesek ji dêya te pê ve nebêje
min çok da erdê û lawik anî!
Zarok ji bo kenê te di lîskê de ne
“Sant axa / Santir axa
Qant axa qantir axa
Hilifî milifî / Çarçûlifî…”
Bes îşka me bişidîn bêdengî
Ma te îşka xwe bi pîşt xist hey zeman

Ka afirîna te hey ê mezin
Av dernayê ji çalên me
Bîrên me tev hestî ne
Ne hestiyê xencera çilkezî
Dil hinav mêlak û gurcikên min / me radikin
Ji pêncî û yek cihan
Lê ew / em tovê jiyanê ne
Mejiyên genî dinizile ji sermilên rutbedaran
Zanistî ketûm û tirsonek
Xwedêgiravî dem dema zanistî azadî û demokrasiyê ye
Lal bêhtir bi ziman in
Bipeyivin
Tiştê ku Xwedê kiriye betal nabe
Çima hûn napeyîvin

14 Nîsan 2009 / Zelê - Amed

**WISA TÊ BÎRA MIN / Berken Bereh**

em çar bira bûn beriya çepera me birûxe
li maleke bê hewş
li kêleka mirîşk û pezan mezin dibûn
zivistanek har û dîn bû heyat
mû ji marî dibir

em bi hemdê xwe mezin dibûn
ew şîrê kurmancî ku me dimêt li hundur
ew işqa sorêtarî şeva tîr
ji rengê bextewriyê bû berf û dia

tiştek heye xwe li min digire û bernade
car ez im car yekî din
tu dibê qey payîzeke har e
her wext li ber delingê min

hinekî kûr bifikirim
bi coş dibêjim em bira bûn
xiyala me bexçeyek têr fêkî
paşê tixûb danîn li vî bajarî
dapîra min ma li wir, ew kezîzer jî

di hişê min de du mirî,yê biçûk birîndar e te digot
li ber têla sincirî desmalên çiryayî
wêneyên xaniyên kavil
wisa tê bîra min wexta kur difikirim


belkî me hev nas nekir belkî
em bi hev re neçûn dirûnê
me nedît çawa insên dimirin bi gaza kimyevî,
çawa diqerise xwîna germ li ser rû

lê em bêdeng jî neman

kengî darek biqelibe
wext veguhere sorêtarî

em çar bira bûn
navek me hebû bakinê,rengek me
tiştine din çi zanim

min ji xew rake ey heyat,coyekê bibîne li hundurê min
lewre em çar bira bûn,wisa tê bîra min.


Asoya Helbestên Kurdî
BERKEN BEREH

**DERIYÊN QIBLEGEHÊN KÊR KIRÎ / Beghyani Shadi Sharin***

**(*Alfabeya wê nehatiye guhertin)**

Li ber deriyekî kêr kirî

Ez qiblegeha zmanê xwa vedidim

Bi pariyek nan, tisî

Bi tasek av, westiyayî.

Leza min nîn e Leza min nemaye

Lezê b' min negirtiye

Lez l' min neketiye Bê lez im

Lezrevok im

Lezśermok im

Lez-ne-hez im di qiblegeha peyvikên min 'ên wêran kirî da. Ez ê źi beźna vê śevê kindtir

Źi beźna vê roźê drêźtir Sondeke nemir bixwînim bi ćekuyên źi zmanê min rakiśandî. U vê gavê Ne tirs Ne xem

Ne źan

U ne źî hêś tê ra derbaz dibe, canê.

(12.11.2012, s00:45, Zürich – Swîsre)

(Źibo girtiyên «bi zmanê kurdî» yên di bin zilma tirkên niźatperest u faśîst da,

źibo yên ku bedenên xwa roź bi roź di birćîbunê da dikin «ala zmanê kalikan» yê di komayê da.)

**CAMÊN SOR / Beghyani Shadi Sharin**

Min berdann ćavên xwa beredayî b' ser da

Ez bume hezyarê camên sor

Hîva li ser kolanên zinêkar

Bi min ra digerre xezal bi xezal.

17.08.2011, s23:40, Zürich / Swîsre

[Źibo xemxur u dilsoźê zmanê bav u kalên xwa,

źibo camêrê ku bi vî zmanî hatî bu

u bi vî zmanê źî ću: Helbestvan Arźen Arî (1956 – 2012)]

**XWEZÎ EZ KULÎLKEK BÛYAM / Ozgur Yûce**

Xwezî ez kulîlkek bûyam,
Li ser çiyayên Zagrosan.
Bayên sivik pelên min bihejanda, Wek dergûşa ku dayika min dihejanda,
Xwezî ez kulîlkek bûyam,
Li ber derya avaşîn,
Û bi dengê xwe ji min re bistriya, wek lorandina dayika min.
Xwezî ez kulîlkek bûyam,
Li ser bedena sura Amedê.
Û bi dengê dengbêjan awazên azadiyê bistriyana
Ku her bi her jiyaneke
Azad ve biçe.

**DÛRKETINA EVÎNÊ / Ozgur Yûce**

Teng dibe asoya dilê min,
Bi hesreta te.
Jiyan tarî dibe li min,
Bê şewq û şemala çavên te.
Dilê min bûye wek gola êşan,
Bi hesreta te.
Rondik ji çavên min dibarin,
Mîna ku baran dibarin ji azmanan.
Di rondikên çavên min de hesreta te,
Di dilê min de hêjariya bê te, evîn
De vegere evîna min
Û av bide giyanê min, bi bêhna xwe
Bila bi bêhna te jîn bibe
Bedena min a stûxwar.

**… / Dilşad Mella**

Li ser sînga hêviya min
Karwanên evîndaran bi rê dikevin
Û li ser pişta xwe
Tûrên evînê dihilgirin.
Biyabanan pê dikin mêrg û çîmen
Ava derya pê şêrîn dikin
Û ji latê hevîr dertînin
Lê mixabin ne karwanên min
Û ne volkanên dilê min
Nikarin bihejînin
Tayekî ji porê te

**… / Dilşad Mella**

Melevan im, di deryaya çavên te de
Xwêya hêsirê te yî germ im
Mîna sêwiyekî bê kes im
Di tunebûna dilovaniya te de
Evîna me ya kevnar
Bîrhatinên zaroktiya me
Û maça ber derî
Bi ketina mijankek xwe re
Binax neke.
Di kûrahiya dilê xwe de
Te dimeyînim
Di çavê xwe de
Te dikim rondik
Û bi jan û xemên xwe
Te divejînim
Hêviya min î bê dawî
Girnijîna min î bê sînor
Di çavê xwe de
pûç neke...

**ÇIMA / Orhan Basî**

Çima te min bi tenê hişt,
Te bi dest tê xwe min kuşt,
Min gelek ji te hez dikir,
Te dil bi xwe re bêr û laş li vir hişt....

Gelo kî çêkir ev nivişt,
Dûrî ji te re kir bihûşt,
Ê ku ji te hez dikirin,
Dawî te wan bi tenê hişt.
Bi tenê hişt bi tenê TENÊ!..



**DEWR Û DEM / Orhan Basî**

Hebûn û nebûna cîhanê,
Dilê min sar kir ji jiyanê,
Dibên bike berxwedanê,
Lê kul û xema min kes nizane…

Dem bûye dema vira,
Li hevdû dikin nifira,
Bira napirse li bira,
Bûye dema rovî û guran...

Kes ne bi halê kesî ye,
Mirovatî bûye wek meşa kûsiyê,
Hevaltî bûye wek bûk û xwesûyê,
Mirin ne li bîra tu kesî ye, MIRIN!..

**… / Mert Mertal**

Kirîvo dengê min tê te
Gelo here bîra te bêhna laşê şewitî
Keziyê daliqandî ...

Kirîvo tu bîr bikî bêbextiya me
Ber çavê te here xaniyê şewitî
Lêngên peritî
Dergûşê beravetî
Pirekên rû qelaştî

Kirîvo çend bavê te li xeribiyê man
Tev çav vekirî, dilşkesti bêkes
Yan li ser riyek man
Yan jî li çiyaki bi mij û dûman
Ax, ax kirîvo
Çîqas rûreş im li hember te
Stûxwar im li dîwana te
Me bibexşîne mezintî ye ji bo te
Ji bo xaka bav û kalê min û te
Kirîvo dengê min tê te

**… / Mert Mertal**

Min xortek dît di şevek reş û tarî de
Dikelîjî... dikelîjî...
Hêstir dibarand ji qezeb
Destê xwe bilind kiribû gazî xweda dikir
Bi dengek çilmîsî nifir dikir
Ey delalêêêê
Tu bijî, çavê te tim şilbe
Çira mala te tim vêxîsti be
Îlancix bikeve çokê te
Penceşêr bikeve laşê te
Porê serê te hemmi daweşe
Ta'şîşk li tekeve
Bext'ê te reş be,wek min
Te min çiqas êşand xweda ewqas te bi eşîne
Te çawa temenekî bêken hişt ji bo min
Tu jî wek min bêken bijî..
Delalêêêê



**TÎ Û BIRÇÎ / Qedrî Nêçîrvan**

(Ji bo wan qehremanên ku di grevên birçîbûnê de dem bi dem, xane bi xane heliyane…)

Çend roj derbasbûne
Ji wê rojê, nizanim.
Çav tarî bûye
Ziman êdî nagere
Û qurequra hinavê ye
Lê dil seranser bi hêviyan dagirtî ye
Bawerî û vîn
Biryardarî û wêrekî
Wekî nan û av e

Goşt roj bi roj dihele
Zik bi piştê ve zeliqiye
Giraniya laş her ku diçe kêm dibe
Lê giranî tenê bi mêzînê tê pîvandin gelo?
Gelo pîvana bawerî û vînê çi ye?
Ya biryardarî û wêrekiyê lê?

Zikê têr ji halê ya birçî fahm nake
Dengê zikên vala naçe guhên kerr
Ne girtîgeh in ên ku em tê de ne
Gor in gor…
Gorên reş û tarî
Gorên sar û bixof

Xwezî dengekî hebûya
Tenê dengekî…
Diya min biloran da li ber serê min
Û ez bi dilxweşî raketama...

**DIÇIM / Qedrî Nêçîrvan**

Diçim...
Carina serserkî
Carina jî bi dilaramî.
Ji çiyan û newalan derbas dikim
Li dû xwe kolanên alûle dihêlim.
Û tu...
Tu li pey min î, her ku gav davêjim,
Her ku ji goşeyeke dizivirim
Deriyan li pey min digirî
Perdeyên şibakan dikşînî
Bi girtina derî û bi dengê perdeyan
Hemû tax, hemû kolan,
hemû kaniyên ku li tewşê ava xwe diherikînin
Hemû zarokên ku li pey topa teqiyayî baz didin
Û di nav xweydanê de mane
Wek xeyalekî, ji ber çavên min wenda dibin
Her kevirê ku ez pê lê dikim
Dibe wek dîwareke nexwiya û
Vegerê li min qedexe dike.
Dawiya rê ne xwiya ye
Dest û ling bêtaqet mane
Di çeka min de tenê guleyek.

**… / Evîn Tetwan**

Rojava…

Roj her ava ye li ser wan
Deng û qêrînên zarok, keç û xortan,
jin û mêran,
Ku va li ber çavan,
bi tirs û bêhêvî man.
Dilê min de wek êşekî,
ku bêderman.
Hewar û fermanên me kurdan,
di nav bêdengiya cihan..
Divê em kurd ji bo hev bibin/derkevin xudan!



**… / Waristan Jîr**

Her gava ber bi veqetinê diavêjim,
Girehişk dikevin qiriqa siberojên min,
Pê dihisim,
Kurtefîlma min î zarokatiyê bi dawî dibe,
Ditirsim, lê ev naşibe tirsa doh.
Her gava ber bi veqetinê diavêjim,
Bahozên çarenûsê xwe li rûçikên,
Mêjiyê min dixe.
Di tariya cîhana ker û gêjan de ,
Ber bi cihekî ne diyar ve dibezim.
Di dil de tenê ne destpêkirina ,
Kirêtiya rastiya jînê heye!
Lê xweziya min di qirika min de dimîne ,
Keçikaniya xeyalê min tê dizîn ,
Û
Ez mezin dibim.

**… / Waristan Jîr**

Tê bîra te?
Di wê nîsana, reng sor de
Di wî bajarê zik telêr û zik birçî de.
Te min bi eniya bejna xwe da naskirin,
Ewqasî dijwar bû parastina wê eniyê
Wî bajarî nema min dihewand.
Ma çi hebû di bîra me de?
Ji xeynî berbangên efsûnî
Gelo ew kenên te ji bihuştê
Dipejiqand?
Kîjan zebaniyê dojehê tirsandibû?
Bêyî wê peyvê bi lêv kim
Zimanê min birîn,
Kelepça di destên min de zingar girtin
Dehakê mêjî xwarî!
Ji belavkirina hingivê me, bi hêrs bibû
Hêlîna me şewitand,
Kezeba te bi cehşên xwe da xwarin
Û
Her şeva Xwedê,
Bê westa xwe bigire
Bi bêjiyê xwe
Telqîna li min
Dixwîn e.

**DIBÊM ÇI BÛYE / Osman Îzol**

Çavên teyê şil
û lêv dihezin
bask şikestî dest vala
bêje çi bûye?

Wusa bêdeng î
ma çarê nîn e?
tu bi dil sotiye
bêje çi bûye?

ji kerema xwe
bibe heval'ek
serê xwe rake
bêje çi bûye?

Ez jî wek te me
dil xwîn dirjîne
wekî bilbil'ê
dibêm çi bûye?

Û ez dizanim
birîn pir kûr e
tu bê welat î
hay bûm çi bûye...

**PORTREYEKE ŞEVEKE KURDISTANÎ / Rênas Xendekî**

Meh-tav e,

Jê re dibên heyveron...

Li ber bayeke hînik û sivik...

Di bin siya Pozê Çeko...

Demjimêr dijmêre demê,

Xwe dozdehê şevê dide...

Li hemberî bajarê mezin,

Di keraxa çemê Dîjleyê...

Bi dayîkirina stêrkên Baxê Îremê...

Îşev serxweş im...

Ji hêla Banê Xanê,

Çavê min li benda hatina karwanan...

Ji hêla Medresa Sor,

Çavê min li benda dîtina Melayê Cizîrî...

Daku bibim şevçirayekî şevên Kurdistanê...

Û bi gezên pêşiyên berbangê,

Di bin betaniyekî,

Li ser textê serbanî,

Dikevim nav xewn û xeyalên keskesorî...

28.05.2013


ASOYA HELBESTÊN KURDÎ

**BILA ÊDÎ BI SERBESTÎ BIFIRIN / Rênas Xendekî**

Her derî,

Li me girtî

Nîn e bo me hevalek bi biratî

Li cîhanê mane tenê

Niha pelîxî...

Xaka me di nav qeyd û bendên sînorî...

Bi peyman û fermanan hemû bûn yek

Kirin armanc parvekirina me,

Serde jî birca belek...

Belavbûn bi çar alî

Hê niha jî nebûne tek...

Li başûr û bakur,

Li rojhilat û Rojava

Her ber xwe didin neviyên Rûstemê Zala...

Ser me şer e

Weke gurê har

Êrîş dikin, xwe digevizin li erda...

Ji serî heta binî

Maye nav xwînî

Li cem me qêrîn û şer qet nesekînî...

Bi rojan bi seetan bi hûrdemên hûrî

Medan û em didin şehîdên pakrewanî...

Xewnên zarokên vî welatî

Her kesk û sor û zerên kurdistanî...

Ciwanên çiyayî

Hildikişin cihên herî bilind ên Zagrosî...

Jin û mêrên vî welatî

Ên dayîk, ên bav, ên karker, ên gundî, ên xebatkar, ên xwendî...

Pîr û kalên giyanşirîn

Xwe dikin, ji bo pêşerojan, gorî...

Me winda kirin

Di bin derên tarî de

Şêx Seîd û Simko û Seyîd Riza...

Îro jî em winda dikin

Di bin reşahiyên herî xirab de

Solînan, Yehyayan, Ceylanan

Û

Hê jî em winda dikin

Di destê wan de, bi pênûsên pîrbûyî

Cigerxwîn, Mehmedê Dirêj, Arjen û Şêrkoyan; bi Bêkes-î...

Lê ka?

Ya Reb ka heta kengî wê halê be?

Ya Reb ka bo çi ye ev qas?

Ya Xweda bila êdî neçilmisin kulîlkên nûvebûyî!

Ya Îlahî bila êdî li vî welatî barana nîsanê boştir bibe!

Ya Ezda bila êdî bi serbestî bifirin çûk û teyrên welatê min li asîmanên şîn!

**12.08.13 / 01:05 / Cizîra Botan**


ASOYA HELBESTÊN KURDÎ